# Bîranîn û Dîrok

Dema civakek ji mafê serweriyê û avakirina saziyên xwe yên civakî û neteweyî bêpar be, zehmet e di wê civakê de di siyaset û warê xebatên çandî de karbeşiyek modern çêbibe. Çawa siyasetmedar ji aliyekî ve pêwîst e ronakbîr, dîrokzan, zimanzan û folkornas be, dema bîranînên xwe jî dinivîsînin gelek caran bi qasî serpêhatiyên wan dîrok, çand, ziman û folklor jî tê de cî digre. Ji ber tunebûna sazûmaniya neteweyî her dem endîşeyek heye ku wê çanda zaroktiya wan bê jibîrkirin û bi endîşeya veguheztina wê tevdigerin. Elbet ev bo me avantajek e ku bi em bi saya wan gelek keresteyên derbarê dîrok, antropolojî, sosyolojî û çanda civakî ya kurdan bi dest bixin. Ya din, bi saya wan em ê bikaribin wêneyekî bêtir giştîgirane yê rabirdûya xwe derxin. Otobiyografiya Şakir Epözdemir *Beşek Ji Serpêhatî û Bîranînên Min* (Fanos, Enqere, 2011) jî dikare di nav vê çarçoveyê de bê nirxandin.

## Şakir Epözdemir kî ye?

Epözdemir di sala 1938an de li gundê Minarê ya bi ser Baykana Sêrtê ve hatiye dinyê. Heta bîst saliya xwe li gundê xwe jiyaye; piştî leşkeriyê bi Diyarbekirê bi cî bûye. Li Diyarbekirê wî û hevalên xwe di sala 1965a de KDP-T damezrandine. Di 1968de ew û hevalên xwe tên girtin û 13 mehan girtîgehê de dimînin. Li bakur cara yekem Epözdemir di vê dawê de berevaniya siyasî dike. Dema 1971ê de Said Elçî û Said Kırmıztoprak (Dr. Şivan) tên kuştin, dev ji siyaseta rêxistinî berdide.

## Jiyana gundan û îro

Epözdemir bi xwe dibêje zanîn yek ji armanca nivîsîna wî nasandina jiyana gundan e. Bi nifşên nû û yên dahatûyê bide zanîn ka ji çi qonaxî hatine çi qonaxî, hay ji wêrara wan a civakî hebe bi niyeta ku “ew tiştên tên qeydkirin... hin ji wan bi kêrî mal û malbatekê, hin ji wan bi kêrî gundekî ango bajarekî, hin ji wan bi kêrî şopa siyasetekê, hin ji wan jî bi kêrî cîhanekê” bên (r.9). Epözdemir bi gelek awayan wêneyekî jiyana gundan pêşkêşî me dike. Wek nîşaneya jiyana gundan pir bi hûrgilî qala têkiliyên malbatî dike, di nav jiyana rojane de navê gelek merivan derbas dibe, mirovan bi giştî bi bavê wan, malbat, an eşîra wan nas dike. Xwînerên xwe dixe nav atmosfera jiyana gundan ya dema xwe lê helbet em baş nizanin ka li vir bêjingek çawa bi kar aniye bo bîranînên “hêja”yî neqilkirine hilbijêre. Bi bibîrxistina tenbiyên mezinan, rêzkirina lîstik û xeyalên zarokan, xeberoşk û metelokên zarokan tevî rengên jiyana gund, tê hîskirin ku Epözdemir hewl dide qismek ji folklora gundê zaroktiya xwe/parçeyek ji çanda kurdî derbasî nifşên nû bike an wan ji jibîrbûnê xilas bike.

## Zimanê kurdî û perwerdeya dewletê

Ev pirtûk yek ji kêm otobiyografiyên bi kurdî hatine nivîsandin. Kurdî kiriye ku him em xwînerên kurdî baştir nifûzî rihê jiyana nivîskar bikin û ji aliyekî din ve hiştiye nivîskar bi wêneyekî baştir ê jiyana xwe nîşanî me bide. Wek mînak, ger ziman tirkî bûya belkî wê nikaribûya ewqas keresteyên folklorîk neqil bikira. Epözdemir di nav şexsiyetên siyasî yên naskirî de yek ji wan mirovan e ku kêmtirîn marûzî perwerdeya dewleta tirk maye. Tenê pênc salan xwendiye. Ji bilî vê jî çend dersên medreseyê xwendiye lê xilas nekiriye. Qasî tê famkirin kêmperwerdebûn, bi saya zîrekiya wî, jê re zêde nebûye asteng. Lê belkî bi saya vê karibûye

otobiyografiya xwe bi kurdî binivîsîne û jiyana kurdewar neqil bike. Li bakur siyasetmedarên bêtir marûzî perwerdeya fermî mane him bêtir ji jiyana kurdewar dûrketine û kesî ji wan serpêhatiyên xwe bi zimanê kurdî nenivîsandine ku ev jî yek ji encamên perwerdeya fermî nîşanî me dide.

Epözdemir malbata wek malmele pênase dike ku pêşiyên wî (wî bixwe jî) medrese xwendine û wiha dewam dike: "Malmeletiya malbata me vê paşiyê zîvirî mamostetiya mekteban. Em ji malmeletiyê şiqitîn hatin bûne mamosteyên komara nedemoqratîk (r.78)" Ev ne tenê guherîna malbata wî ye. Ev pêvajoya guherîna civaka kurd a ji hişmendiya kurdewar ber bi tirkiyeyîbûnê (an tirkbûn) ye jî.

**Oto-bêhafizekirin (ve peyvê cara yekem bi kar tînim, nizanim bi we çawa ye? ger bo rewşa ez li jêr tarîf dikim peyvek baştir, alternatîf hebe, em dikarin biguherînin)**

Zanyarên li ser bîra civatî dixebitin dibêjin, dema civatek tûşî qirkirin û karesatên mezin tên, kesên mayî meyla wan bêtir ber bi jibîrkirinê ve ye. Heta ji destên wan tê, serboriyên xwe ditepisînin, naxwazin ji zarokên xwe re qala wan bikin bi niyeta ku wan ji karesatên nû biparêzin. Ew nifşê ewil ê piştî qirkirinê bi destê dê û bavên xwe tên bêhafizekirin. Belkî mezinên wan jixwe dizanin ku bîra kolektîf parçeyek ji hebûna wan e, nahêle endamên civatê wek ku ew tunebe tevbigerin. Mirovan dike nav tevgerê. Hê du nifş şûn de endamên civatê wê hêzê di xwe dibînin li bîra xwe bikolin, êdî nikarin wek ku ew tunebe tevbigerin. Di nav bîranînên Epözdemir de mînakeke baş heye ku mirov têxe nav vê çarçoveyê.

Apê bavê Epözdemir Haci Kamil Efendî li Bidlîsê di salên 1913-14a de bi sedema dijî îtihadparêzan piştgiriya Mela Selîm kiriye ew jî hatiye darvekirin. Keça wî Şefîqe xanim jinapa Epözdemir e. Şefîqe xanim, dema darvekirina bavê xwe de 16 salî bûye, wê qet behsa darvekirina bavê xwe ki zarokên xwe re nekiriye, gotiye bavê wê di germavê de fetisiye. Herwiha Epözdemir û kesên din ên malbatê jî bi vê nizanin ango mezinên malbatê dizanin lê nabêjin. Şefîqe xanim heta wefata xwe jî ji kesî re rastî negotiye. Di salên 1990î lêkolîner Müfîd Yüksel ji arşîvên osmanî derdixe ku ew di germavê de nefetisiye lê hatiye darvekirin.

Epözdemir zêde liser sedemên vê veşartinê nasekine. Em baş nizanin ka Şefîqe xanimê ji tirsa xwe rastî vedişart an ji ber atmosfera serdemê wê ji ber aqûbeta bavê xwe fedî dikir û di binhişê wê de ne hêjayî bibîranînê bû. Lê sedem her kîjan be, encam oto-bêhafizekirin e, ev rewşa şexsî an malbatî rewşeke tîpîk e ku dikare bo civaka kurd bixwe jî bibe mewzûbehîs, oto-bêhafizekirina civakan jî kêm zêde bi vî awayî dimeşe. Dû re rastî çiqas derkevin holê jî ew qelîştekên di hişmendiya civakê de vebûne êdî nayên girtin, tiştên hatine windakirin gelek in.

**Hafizeya serdestan**

Ji bîranînên Epözdemir jî diyar dibe di derdora ew tê de mezin bûye bîreke derbarê dîroka nêz zêde tuneye an ji aliyê mezinên wan, wek Şefîqe xanimê, tê veşartin. Epözdemir diyar dike dema li Kütahyayê leşkeriya xwe dike leşkerên tirk bi heqaret ji leşkerên kurd dipirsin "Kurdo ka bêje te çend cendirme kuştine!?" Ew dibêje heta wê çaxê nizanibûye kurda cendirme kuştine (r.133). Kurdekî ku qet haya wî ji serhildan û qirkirinan tuneye, yanê bêhafize; li aliyê din tirkên "xwedî hafize". Sal 1958 e, heta vê salê bi rêya wêje, çapamenî, saziyên din

û bîranînên tirkên li Kurdistanê şer kirine hwd. di serê tirkan de îmajeke gelek xirab a kurdan êdî rûniştiye. Kurd, haya wî ne ji wan heye, ne ji xwe heye! Ma wê çawa hebûya?! Ne tenê ew pirs, tenê ji ber kurdbûna wî jê re gelek asteng derdixin. Baş e ku Epözdemir bi saya zîrektî û wêrektiya xwe ji bin wan radibe le yên ku nikaribûn rabin, çi bûn gelo!?

Bi qewlê Epözdemir "bindest wekî qirşikên ser avê ne, ba li wan dide û ew jî alî alî ve tên diçin" hafizeyek tuneye giraniyekê li ser wan çêbike da ku ba wan her dem nede ber xwe.

**Destpêka du xetên cuda di siyaseta kurd de**

Di bîranînên Epözdemir de jî bo tespîtkirina destpêka du xetên cuda yên siyaseta kurd de hin delîl hene. Ew xeta ku kurd wek neteweyekê qebûl kirine, çi mela, çi axa, çi gundî, çi şêx be hemû kurd di bin vê banê de bûn li gor wan û doza serweriyê dikirin. Xeta din, ji dijberiya siyaseta dewleta serdest zêdetir, din bin bandora vatişên tirk û kemalîst de, di destpêkê de tebeqeya dîndaran û sîstema eşîrtiyê kirin hedefa xwe ku wan rê li ber pêşveçûnê digirtin. Sedemên serkeftina ya duyem û têkçûna ya yekem hêjayî nîqaşê ne.

Epözdemir qala mîtinga li Farqînê ya bo petrolê dike. Mîting ji ber şertên wê demê bi alikariya TİPê pêk tê. Li gor neqilkirina wî, TİP dibîne ku tişta xelkê dihejîne ne slogana "Karkerno, Gundîno!" ye. Lê dînamîzma gotina "Çiyayê Bîngolê" bi serê xwe meydanê dihejîne. Seîd Elçi wisa diaxive: "*Hûn dev davêjine şêx û axan, ka bêjin niha dewletê li ku fabrîqeyek vekiriye û şêx û axan ew fabrîqe kilît kirine. Ev ne meseleya şêx, axa, karker û gundiyan e. Ev pirs pirsa zîhniyeta dewletê ye. Dewlet wekî welatiyên xwe li herêma Kurdan mêze nake. Dewlet herêma me wekî welatê xwe yê esîl napejirîne. Dewlet ferq û meylê dike û bi çavê kurê jinbavê li Kurdan mêze dike* ." Gotinên ku di wê mîtingê de zêdetirîn bandor kiriye ev bûne. Piştî wê Elçî tê sirgunkirin bo Kutahyayê.

Bîranînek din jî li ser Dr. Tarik Ziya Ekinci ye. Botiyên li Diyarbekirê di sala 1963ya de dixwazin komeleyekê ser navê Botan ava bikin. Li qehwexaneyekê civînekê çêdikin ku ji fabrîkator heta karker û melayan ji hemû tebeqeyan kes beşdar bûne. Yek ji wan Tarik Ziya Ekinci ye. Ekinci bi axaftinên xwe yî di nav çarçoveya marksîzmê de civînê sabote dike; him komele nayê avakirin him dilê gelek kesan jixwe dihêle. Di heman salê de Ekinci dibe talibê şaredariya Diyarbekirê lê li gor Epözdemir, ew ji ber helwesta xwe ya çep winda dike. Xwezi Epözdemir qala bêtir hûrgiliyên wê civînê û atmosfera giştî ya fikrî ya wê demê kiribûya.

**Kuştina du Seîdan û dawiya siyaseta rêxistinî**

Epözdemir di vê pirtûkê de di 1971ê de, sala ku xwe ji siyaseta rêxistinî vedikşîne, sekiniye. Ev sal sala kuştina Seîd Elçî û Dr. Seîd Kirmizitoprak e jî. Ev bûyera ku hê jî ji bîranînên wê demê wêdetir bi ti belgeyên fermî nehatiye îzehkirin û zelalkirin, yek ji encamên gelek aloziyên siyaseta kurd e li gor em ji bîranînên Epözdemir fam dikin: xebata bêprensîb, di nav xwe de neşefaf, bêbingeh ku gelek caran insiyatîfên şexsî berê rêxistinan tayin kiriye an wisa xuya dike. Û helbet rola îstixbaratên dewletên serdest û têkiliyên wan î di nav siyaseta kurd de ku îro encax dikare bê texmînkirin û kî dizane em ê kengî bi awayekî eşkere bi wan bizanibin. Bi vê bûyerê him du xweşmêrên kurd ji holê hatin rakirin him aloziyên nû bixwe re

anî. Belkî jî ev bû destpeka têkçûna xeta yekem a di siyaseta kurd de. Em hêvîdar in Epözdemir di cilda duyem de derbarê piştî pêvajoya vê bûyerê agahiyên bêtir bi hûrgilî bidin.